




### Efrîn di bin dagîrkeriyê de (203):

**Gundê"Çolaqa" - desteserkirin û niştecîkirin, pevçûnin li ser erdekî desteserkirî, dijberiyek li ser temenmezinekî Êzdî, şewatên daristanan û dizîna kevneşopan**



حفر الأراضي بين قرينتي "جولاقا" و فقيرا"- جنديرس بحثاً عن الآثار التاريخية وسرقتها

خيم للمستقدمين بين حقول الزيتون- قرية "جولاقا"- جنديرس



عانة خراجية غرب قرية "جولاقا"- جنديرس نيسان 2018م بداية الاحتلال

غابة جنوب قرية "جولاقا"- جنديرس بمنطقة تقريبية 1/27 هكتار، أي 2.19 قبل الاحتلال والقطع

عانة خراجية غرب قرية "جولاقا"- جنديرس آب 2020م بعد الاحتلال والقطع

توقيع عانة خراجية جنوب قرية "جولاقا"- جنديرس آب 2020م بعد الاحتلال والقطع



الممنع المصاب ناصر عمر علوش قرية "بهيبة"- جبل ليلو

عبد الرحمن كمال شيخو

التيه العليل إبراهيم رشيد شو



حريق في غابة "حج حسنا"- جنديرس، 11 حزيران 2022م



حريق في غابة "امروانده تحمالي"- جنديرس 15 حزيران 2022م

**B**i ser destdanîna li ser malmewalên xelkê li herêmedê, û tarûmarkirin û dizîna hin malmewalên din bi rengekî fere û bi navê "şoreş û cîhadê", çekdar û anîndeyên girêdayî Hemahengiya (Itîlafa) Sûrî - Ixwanî û Turkiyê li hev dixin, û li ser tiştên dizîn û çarçewa bandoriyê hevrikî û nakokiyan bi hev re dikin, û li ser saz û awazên dijayetiyan Turkiyê, şoven û nijadperestan ên li dijî Kurdan û herêmeden wan, dadikevin asta herî nizim ji perensîpên sinciyane.

#### **Ev jî hin bînpêkirin û tewanên têvel in:**

##### **= Gundê "Çolaqa":**

Bi Navça Cindirêsê ve girêdayî ye, /13/ KM ji navenda wê dûr e - Bakur Rojhilat, ji dora /90/ malî pêkhatî ye, dora /550/ nişte ji nişteciyan Kurd ên resen tê de bûn, li dema dijberiya li ser herêmedê hemî penaber bûn, jê dora /70 malbat=225 nişte/ vegehin û yê mane jî zorane koçber bûn, û dora /125 malbat=750 nişte/ ji anîndeyan tê de -piranî di çadirên ku di nav zeviyan û li dor gund venandî de- hatin nişteciyî.

Li karnava dijberiya li ser herêmedê çend caran gund hate topebarankirin, di encamê de cîgeheke perwerdekirina mirîşkan e "Mehmûd Selîmê" bi tevahî hate roxandin, bi piçekî jî ziyar gihîştê dîkanekê, û bi ser de jî tirsandina xelkê.

Li rex hebûna Milîseyên "Tevgera Ehrar El'şam", Milîseyên "Firqit El'hemzat" - e ku dest daniye ser qesra "Ezet Menan Axa" û beşek jê ji xwe re kiriye biryargeheke leşkerî û beşê din jî kiriye mizgeft- gund desteser dikin; Wan piraniya kelûpel û tiştmiştên hundir malan, ji xwarinveşwarin, firaxên baqirî, alav û amûrên elektrîkê û taqeta elektrîka roniyê û yê din dizîn, û piştî basmîşkirina gund, bi behaneya hebûna bombeyan, bêtirî deh rojan qedexa kirin ku xelk vegere gund, û bi ser de jî dizîna makîna û tirektora "Ezet Menan Axa", tirektor û matora duloqî yê "Xelîl Beşîr", tirektor û makîna "Xelîl Mûrad", giropeke zayenda elektrîkê (ampêr) e mezin e "Henan Seydo", guheztok û keblên toreya elektrîkê ya giştî û keblên telîfûna zemînî.

Û weha wan dest danîn ser dora /10/ hezar darên zeytûnê ji tevahiya /50/ hezar darên gund, jê yê "Xelîl Beşîr, Xelîl Mûrad, Malbata Selîmê, Malbata Beskê, Malbata Zênelûşê", û 10% li ser berhema werzên (mûsim) hemwelatiyan hene û 40% li ser yê ne li gund -ên ku merivin wan ji ber ve radikin dîdinin- vêrgî ferz kirin, ji bilî dizînen berhemên zeytûna li mûsimê, û bi ser de jî ferzkirina vêrgiyan -bi bûne û vêbûne- li ser halxweşan.

Û piştî du salan ji dagîrkeriyê û karanîna hemî zext û fişaran li ser Hemwelatî "Xelîl Mûrad Mûrad" û ferzkirina vêrgiyên diravî yê mezin li ser, û neçarkirina wî li ser koçbarkirina zorane ji herêmedê, milîseyan dest danîn ser malmewalên wî (kargeheke tijîkirin û parastina zêtûnê sifrê û acetên wê, Makînak Honday, mal û tevahiya tiştên tê de, perçerdeki avahiyan li nêzik Cindirêsê /750/ m<sup>2</sup> ye ku avcêngehek tê de çêkirine).

Û milîseyan bidehan darên ihracê yê temenmezin di hundir gund de qut kirin, û weha jî qutkirina du daristanan li Başûr û Rojavayê gund tevî agirpêxistinê bi awakî mebestkirî, ew jî bi vegeer ji wêneyên Gogêl Êrs re berî û piştî dagîrkirin û qutkirinê, li (Rezbera 2017an Z, Tebaxa 2020an Z) ji daristana Başûr re -bi rûbera /23/ hiktaran- asta qutkirin û şewtandina fere jê re tê diyarkirin, û li (Avrêla2018an Z, Tebaxa 2020an Z) ji daristana Rojava re qutkirina giştî ji dora /1/ hiktaran re diyar dibe, û ji ber ku ew destdirêjî ji herdu daristanan re di navboriya herdu salên borî de berdewan in, ji ber wê mirov kane bibêje ku tu tişt jê nemaye.

Weha jî wan ji bo lêgerîna li kevneşop û kinzên binerd û dizîna wan, nav erdên çandiniyê yê di navêna herdu gundên "Çolaqa" û "Feqîra" de kolan û şikeft tevdan; Û hin gorên ku bi Kurdî li ser hatine nivîsandin wêrankirin, mîna gorên Pakrewan "Gulîstan Hesên" û dilovanberê Barker "Ebid El' Rehman Hemadê".

Û weha jî xelkê gund ên mane rastî cûreyên têkel ji bînpêkirinan hatin, ji revandin û girtinên bêşûcane, îşkencekirin, kêmrûmetkirin û peresitandin û yê din; Bidehan û bi demên têvel hatin revandin û girtin digel ferzkirina vêrgî û sezayên diravî, nimûne xort "Ebid El'rehman Osman kurê Xelîl - 1990 .Z" li 2.8.2018an Z, bi tuhmata têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re, û weke zanyarî, ew di Hepsa Çobanbegê (El'ra'î) û Babê de zorane hat veşartin, ta ku li 11.3.2021an Z ji Hepsa "Maratê" - Efrîn hate berdan.

Weha jî Destlatên Dagîrkeriyê hemwelatî "Ferîd Mihemed Reşo, Henan Seydo kurê Şêx Mihemed" li Avrêla 2021an Z -piştî qedandina sê salan di hepseke Bajarê Entekê yê Turkiyê de- berdan, û divê bête zanîn ku ew li Avrêla 2018an Z ji mala wan li gund hatin girtin, û bo hundir Turkiyê hatin birin.

Û ji zaroyên gund Zarok "**Ibrahîm Reşîd Reşo /5/ sal**" di encama topebarana Gundê "Qenterê" de - Navça Mabeta li 24.2.2018an Z şehîd ket, û birayê wî "Husên Reşîd Reş/9/sal" û bavê wî birîndar bûn, piştî ku malbat ji "Çolaqa" penaberî wir bû.

Û Hemwelatî "**Ebid El'rehman Kemal Şêxo /30/ sal**" yekser bi sekna dil mir, piştî ku makîne, tibabeke diravî û alavine elektirîkê yên malane jê hatine standin, li dema vegera wî bo gund li 10.6.2018an Z, ji aliyê rêbendeke çekdar ve, li çateriya Gundê "Keferdelê Jêrin" yê hevciwar.

Û li 18.12.2020an, teqandinek mezin di embareke çekan û zexîrê ye Milîseyên "Ehrrar El'sam" li gund çêbû, agir pêket in, û di encamê de parêzkarên wê hatin kuştin.

Û li 24.9.2020an Z û 12.2.2022an Z jî, di nav Milîseyên "Ehrrar El'sam" û "Firqit El'hemzat" de li gund û derdorê, bi sedema nelihevkinê li ser çarçewên bandoriyê û dizînan pevçûnin derketin, û di encamê de hin endam ji herdu aliyan hatin kuştin û birîndarkirin, û tirs di nav xelkê de çêbû.

#### **= Girtinine bêşûcane:**

##### **Destlatên Dagîrkeriyê ev girtin:**

- Ji deh rojan ve, Hemwelatî "Ehmed Mihemed Reşo /35/ sal" ji xelkê Bajaroka "Kefirsefrê" - N.Cindirêsê, piştî vegera wî ji Turkiyê, bi tuhmata têkeliyê bi R.X a berê re; Û divê were zanîn ku ew ji destpêka kirîza Sûriyê û berî damezrandina wê rêvebiriyê koçberî Turkiyê bû.

- Li 14.6.2022an Z, Hemwelatî "Eslan Şêxmûs Hebeş /39/ sal" ji xelkê Gundê "Kêla" - Navça Bilbilê, cara sisiyê bi tuhmata Têkeliyê bi R.X a berê re, û ta niha bêşûcane bendkirî ye.

- Li 16.6.2022an Z, Hemwelatî "Mihemed Ehmed Mistefa /38/ sal" ji xelkê Bajaroka "Kaxrê" - N.Mabeta û li Taxa Eşrefiyê li Bajarê Efrînê rûniştî, bi tuhmata têkeliyê bi R.X a berê re, û ta niha bêşûcane bendkirî ye.

#### **= Bêşûberî û serberdayetî:**

Li 14.6.2022an Z, di navêna du giropên anîndeyên ku li Gundê "Firêriyê" de - N.Cindirêsê (ya yekê ji Êla El'cemelan - Gundewarê Hemê yê Rojhilat û bi ser Milîseyên "Firqit El'hemzat" ve û dora /500/ seriyên pêz li cem hene, û ya diwem jî ji Bajaroka "Encarê" - Gundewarê Heleb a Rojava û bi ser Milîseyên "Nûr El'dîn Zenkî û El'sultan Silêman Şah" ve) pevçûnin derketin, û di encamê de pênc kes (/3/ ji El'cemelan û /2/ ji Encare) hatin kuştin û şeş birîndar bûn, û di dû re rewş di nav milîseyan de li hev ket, bi sedema nelihevkinê li ser çêrandinê di pirêzak gênim de - erdekî ji aliyê yên bi ser Hemzata ve desteserkirî.

#### **= Binpêkirinên din:**

- Ji heftakê ve yekî ji anîndeyên Gundewarê Şamê û dest daniye ser maleke Gundê "Bihiyê" - Çiyayê Lêlûn, mekin li temenmezîna Êzdî "Nasêr Umer Elûş" xist, û di encamê de dest û lingê wî yên rastê şikîn û birîn û derzandin di govde de çêbûn, bi behaneya ku çêla temenmezîna derbas mala ku dest daniye ser bûye, di heman dema ku temenmezîna lezker ku çêlê derîne.

- Bi sedema destdirêjiyên fere li ser daristan û zevî û erdên çandiniyê, zêdebûna pileyên germiyê û carina jî bi regekî mebestkirî, hin şewat di daristanan de çêbûn "(17Pûşperê - G.Remedana, 15 Pûşperê - G.Merwaniyê Jêrin, 11 Pûşperê - G.Hechesna) li N.Cindirêsê, (12 Pûşperê - G.Maseka) li N.Reco, û li 14 Pûşperê li erdekî çandiyê li Gundê "Dêrbelûtê" - N.Cindirêsê, û "Berevaniya Sivîl li Efrînê" tekez kir ku tîpên (tîmên) wê ew şewat vemrandine.

- Li vê dawiyê Milîseyên "Firqit El'hemzat" li dor Gundê "Birc Ebdalo" - Şêrewa ji bo dizîna li kevneşopan gerîn, û di gerînê de amûr û alavên naskirina bombe û madenan bi kar anîn; Û li sala borî Girê Birc Ebdalo yê kevneşopî bi şewakî fere kolan û rêşkirin, û kinzên binerd jê dizîn.

Bêdengiya navdewletî li ser rewşên pîs li Efrînê û neberpirsiyarkirina Turkiyê ji ber ve -bi ser ku ew bi hemî pîvanan dagîrker e- Hikometa Anqerê û nandozên wê têve dide ku binpêkirin û tewanên bêtir di dermafê herêmê û xelkê de bikin, û guhertina demografiyê tê de kûr dike.

19.06.2022an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**  
**Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

-----  
**Wêne:**

- Hin çadirên anîndeyan li nav zeviyên zeytûns li G. "Çolaqa" - N. Cindirêsê.
- Kolandin di nav erdên çandiyê de, yê li nava gundên "Çolaqa" û "Feqîra", ji bo lêgerîna li kevneşop û kinzên binerd û dizîna wan.
- Daristaneke îhracê li Başûrê G. "Çolaqa", berî û piştî dagîrkerin û qutkirinê.
- Daristaneke ihracê Rojavayê G. "Çolaqa", berî û piştî qutkirinê.
- Pakrewanê zarok "Ibrahîm Reşîd Reşo".
- Dilovanber "Ebid El' Rehman Kemal Şêxo".
- Temenmezinê birîndar "Nasêr Umer Elûş".
- Şewatek li daristana "Merwanîyê Jêrin" - N.Cindirêsê.
- Şewatek li daristana "Hechesna" - N.Cindirêsê.